



## Li ber deriyê dîrokê, pêwîstiya yekitiya neteweyî û hişmendiya milî

Di derbarê mijara yekitîyê de, dîroka me ya dused salên dawî bi alîyên xwe yên erênî û neyênî li ber çavan e! Ji ber ku di warê hişmendîya neteweyî de, di warê mafên miletbûnê û daxwazên desthilatdarîyê de problemên me yên bingehîn hene û di heman deman de wek qeydek asê dest û lingên me girêdaye, rê li ber asoya me ya neteweyî tarî kirîye û weke girêkek kor li ser serê me hatîye daliqandin. Dom»R:9&10




## Şeva Yeldayê, Zayîna Ronahiyê, jidayîkbûna şehîd Dr. Qasimlo



Di çanda Kurdî de, Şeva Yeldayê di heman demê de sembola serkeftina ronahîyê li ser tarîtiyê û destpêka rojvegera zivistanê ye. Ji bo Kurdan, ew xwedî wateyek kûr a rîtuelî, çandî û kolektîf e.Jidayikbûna şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo di şeveke wiha de vê sembolê bi awayeke xweşik bi ramana aştî, edalet û wekheviyê ve girêdide, û her wiha di bîra neteweyî ya Kurdan de aliyeke siyasî-dîrokî dide Yeldayê.

Dom» R:5

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (508) 24-12-2025*

## Şivan Perwer, Dengê ku dîrok şiyar kir



**Pêşgotin: Senfoniya ba û kevir**

Bayekî sar ji çiyayên Qerejdaxê li deştên Cizîr û Wêranşarê dihat. Gundê piçûk, bêdeng û kerr, di nav çiyayan de winda bibû, ku weke hezar sal bûn tiştek ji bilî hûjîna bayê û ahenga hov a xwezayê nebihîstibûn. Di vê bêdengiya giran de, kurek bi porê tevlîhev, rûyê ji ber tavê şewitî û nêrîneke ku kûrahiya wê ji temenê wî mezintir bû, li pişta dîwarekî herî rûniştibû. Ew bi darikekî zirav li kevirekî dixist. Rîtmeke sade, seretayî, lê bi pergal.

Dom» R:6

# Tîrêjên Rojê ti carî kêmşewq nabin



Piştî dirêjtirîn şeva sala 1930 a Zayînî, anku şev çile "Yelda" ku bi ji dayîkbûna Zarokekî, şewq û şemal û ronahiyê tîrêjên xwe avêtin ser zilmat û tarîtiya wê şeva dirêj û her der ronî kir û tava rojê hilda, 95 sal derbas dibin. Ev jî jidayîkbûna Ebdulrehman, kurê Mihemed Axayê Wisûq li gundê Qasimlo girêdayî bi bajarê Urmiyê bû.

Ev Ewdulrehmanê ku pişte bi Qasimlo û pişte bi Dr. Qasimlo û rêber û xwedî rêbaz û kesayetiyê karîzmatî ê tevgera Kurd hate naskirin.

95 mom û şemal îsal li Rojhilatê Kurdistanê û li mala heçî Kurdekî xwedî hest û evîndarê rêbaza Qasimlo de hatne hilkirin, îsal jî piştî derbasbûna 95 salan, Qasimlo li her malekî û li hizr û yadê herkesekî de jidayîk bû.

Piştî wê şevê ku dirêjtirîn şeva salê bû, heta niha 95 şevên wekî wê anku 95 "Yelda" û dirêjtirîn şevên salê derbas bûne û mixabin ew li 59 saliya xwe de li bi destê terorîstên ku ji aliyê "wilayeta Feqîh" yên rûniştiyê Tehranê ve hatinî şandin şehîd kirin, lê ya ku jiyaye û dijî, hizir, dîtingeh û baweriyên wî xortê nîştiman û mekteba hizra wî ye ku ne tenê di gundekî de sînordar nemaye, belkî Kurdistan û Îran li xwe girt û dengvedana navnetewî hebû.

Dr. Qasimlo li dirêjtirîn şeva salê de ji dayîk bibû û bi têkoşîn û hizr û bawera xwe, dixwest şeva dirêj a li ser Kurdistanê bişkêne û tarîtiya sepandî li ser welat birevîne û bi tîrêjên rojê, netew û nîştiman ronahî û gerim bike û keskatî û avedanî û jiyanê berhem bîne.

Ya ku xortê jidayîkbûyê şeva Yeldayê ava kir, niha mekteb û rêbazekî mezine li Kurdistanê, û bûye çavkaniya hêz û hizrê bo xortên wî welatî ku dixwazin azad, serbest û wekhev li ser axa xwe bi serweriyê ve bijîn.

Qasimlo piştî 95 salan roj bi rojê tîrêjên hizra wî bêtir şewq dide û hemî mal û dil û hişmendî û fikara gelê me de cih girtiye û tîrêjên hizr û rêbaza wî, nihajî digel tarîtiya dîktatorê serdem berekaniyê dike û bêguman heya ronahî bi ser tarîtiyê de sernekeve û ti carî ev şewq û tîrêjên hiviyê kêm nabin.

Qasimlo Yeladaya 95 mîn a temen xwe de jî, li seranseî Kurdistanê de carekî din ji dayî bû û şewq û ronahiya wî, çavê peleçemkên tarîperest kor kirin.





## Peyama pîrozbahiya rêzdar Mistefa Hicrî bo Dr. Berhem Salih

**Rêzdar "Mistefa Hicrî", Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta hilbijartina Dr. "Berhem Salih" wek serokê Komîsaryaya bilind a Netewên Yekgirtî li Karûbarên Penaberan anku "UNHCR", peyameke pîrozbahiyê belav kir.**

**Deqa peyamê wiha ye:**

Rêzdar Dr. "Berhem Salih"

Tevî silav

Hilbijartina te bo posta "Komîsaryaya bilind a Netewên Yekgirtî li Karûbarên Penaberan" cihê keyfxweşiya me ye.

Em Hivî dikin ku bi jêhatîbûnek ku we heye, li erk û berpirsyariyetiya nû de serkevtî bin û bi vê rêyê bikarin xizmetê bi karûbarên penaberan û aliyê mirovahiya vê pirsa girîng bikin.

**Mistefa Hicrî**

**Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**13ê Kanûna Pêşîn 2025**



## Peyama Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta 26ê Sermawezê

Dom » R:2



## Pêşmergeyê Kurdistanê, hêza Kurdî û binavûdengê cîhanî

Dom » R:4

# Peyama Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta 26ê Sermawezê, roja Pêşmerge û Ala ya Kurdistanê




**Xelkê xebatkar ê Kurdistanê!**
**Cîvatên welatparêz,**
**Pêşmergedost û Alaparêz!**

**Pêşmergên canliserdest ên Kurdistanê!**

Li ser navê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, em pîrozbahiya roja 26ê Sermawezê, roja Pêşmerge û Ala ya Kurdistanê li ve hemû rêvîngên doza azadî û serbilindiya Kurdistanê dikin, û bilindbûna Ala ya Kurdistanê li sîbera Pêşmerge û we fîdakarên niştîman li hemû bajar, gund û deverên Kurdistanê bi hivî dixwazin.

Rêkevta 26ê Sermawezê ku ji aliyê Deftera Siyasiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ve wek roja Pêşmerge û salên piştre jî wek roja Pêşmerge û Ala ya Kurdistanê hatiye navdêrkirin, li Rojhilatê Kurdistanê de bûye beşek ji hizra giştî ya gelê me û her salê bi şêwazên cur bi cur bi rêz ve tê bîranîn.

26ê Sermawezê, ji wan rojên girîng ên dîroka netewa Kurd e ku li dîroka xebat û tekoşîna vê netewê de bûne rûpelên zêrîn û hêmaya rawestan li hember sitem û bêdadiyê.

Ji vê rojê ve, Hizba Dêmokrat wek Hizbek modern û xwedî bernam, pê avêtiye meydana xebat û tekoşîna siyasî a Kurd û Ala ya netewiya Kurd wek hêmaya serwerî û nasnamexwaziyê bilind kiriye, afirênerê hejmarek remz û nirxên şoreşvanî û bi mana û wate bûye ku heta îro jî bandora wan bi ser hemû tevgera siyasî a Kurdistanê tê dîtin.

Roja 26ê Sermaweza 1324 a Rojî de Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, Ala ya Kurdistanê wek hêmaya desthilata xwecihî li ser bînaya şarevaniya bajarê Mihabadê bilind kirin û bi vê şêwazê rewş bo ragihandina yekem hikûmeta Millî-Dêmokratîk a netwa Kurd li ser destê Hizba Dêmokrat amade kir.

Piştî avakirina Komara Kurdistanê, beşa herî berçav a vê hêza xelkî ya ku li tevpêçana desthilata Pehlewî de rola bingehîn hebûn, li sipaha millî ya Kurdistanê de hatine rêkxistinkirin ku piştere li serdema komara Kurdistanê de ji aliyê rêberên Komarê û Hizba Dêmokrat ve, navê Hêza Pêşmerge pê hate bexşîn ku erkê pîroze parastina ax û Ala û hêmayên din ên netewî yên Kurdistanê li kêşa ustiyê xwe.

Pêşmerge, yek ji civantirîn û bedevtirîn û watedartirîn peyvên çanda Kurdî ye ku taybetmendiyên şorşgêrane yên mirovê Kurd li xwe de kom kiriye û bûye pênasa asta herî bilind a bivêrî, fîdakarî, geldostiyê.

Hêza Pêşmergê Kurdistanê ku Alahilgirê xebata neteweya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û piştre li beşên din ên Kurdistanê bûye, ji roja avakirinê vê heta niha, ewraz û nişîvên curbicur derbas kirine û gelek zehmetî û astengî ceribandin e û dîrokek tejî şanazî û qehremantiyê bo netewa me tomar kirin e.

Ev hêza jixwederbasbûyî, can û jiyana xwe daniye ser destê xwe, da ku gelê xwe bi zindî û serbilindî bihêle û Ala ya vê bilind rabigre.
Niha ku em dibînin navê Pêşmerge bûye xoşewîstê civaka Kurdistanê û li seh û hundirê xelkê de amadehiyek berdewam heye, ev bi vê mana û wateyê ye ku navê Pêşmerge û erkê Pêşmergetiyê bûye beşek ji kultûra netewî a kesê Kurd û li yek alitiyê de sînodar nemaye.

Tevî vê yekê jî niha navê Pêşmerge sînorên kurdistanê derbas kirine û li paytexta welatan û li kom û civînên navnetewî de wek hêza parêzerê nirxên mirovî û dêmokratîk tê mêzekirin û rêzek taybetî jê tê girtin.
Şanaziya beşa herî zêde ya wan bo fêrgeh û rêbaza Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê vedigere ku ew, avaker û afirînerê vê hêzê û herwisa perwerdekarê vê hêza xwedî piristîj bûye.

**Xelkê xweragire Rojhilatê Kurdistanê!**
**Pêşmergeyên xwedî bawer ên netewa Kurd!**
Îro ku zêdetirî ji her demekê hêviya hilveşîna deshilata dijemiroviya komara îslamiya Îranê heye, hewce ye em li ser zindîragirtina hêmayên newiyên me bi taybet Ala û Pêşmergê Kurdistanê, mukum bin.
Niha dema vê ye ku Hizb û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê, nirxên hevparê xwe ên wek Pêşmerge û Ala, bikin hêvinê bihevnêzîkbûn û yekgitinê.
Bi balkêşandin bi ser taybetmendiyên xebata gelê me û sirûşta bêrehmaneya dujminên maf û azadiya Kurdistanê, bo me tê selimandin ku hebûna Pêşmergê Kurdistanê dikare çi karlêkerî û bandorek mezin li ser parastina şan û kirameta netewiya me hebe, Parastin û bihêzkirina Hêza Pêşmergê Kurdistanê çi li serdema xebata Çiya û rizgarîxwaziyê de, û çi li serdema piştî rizgarbûna netewî, hewcehiyek hestiyar û girîng e.

Niha li vê qonaxa dîroka netewa me de ye ku hewce ye em rizgariya netewî û nehiştina her cure sitem û cudatîdanînek li pêş her daxwaziyek din de dabinên.
Li rewşa niha de berpirsayetiyeke dîrokî li ser milê me hemûyan e ku li hember her cure hewleke jinavbirina nasnameya netewî û siyasiya de pêk hatiye, em refên xwe qahîmtir bikin.

Ev yeka jî bi yekgirtina xebatkarane û bi qahîmkirin û bihêzkirina çeperên tekoşînê tê kirin. Her wek Rêberê Şehîdê “Dr. Qasimlo” gotiye: “Pêşmerge û gel ji hev nayên cudakirin”, wataya vê gotinê ev e ku armanca wan jî yeke, ev jî gihîştin bi mafên mirovî û netewî ye û dibe li pêxema vê de pitir ji berê, hevxwest û hevpêngaw bin.
Li dawiyê de bi hilkefta vê roja tejî serweriya netewa xwe de, em pîrozbahiya gerime xwe pêşkêşî we hemû pêşmergeyên qehreman, xelkê xebatkar û pêşmergepewer ê Kurdistanê dikin û hevdem digel Şehîdên xwe û malbatên serlindindên wan, peymanê nû dikin ku heta gihîştin bi armancên wan, em xebat û tekoşîna xwe bidomînin.

**Her bilind be Ala ya Kurdistanê!**
**Serbilindî bo Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê!**
**Serkeve xebata berheqe netewa me!**

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**
**17ê Kanûna pêşîn a 2025 a Zayînî**
**26ê Sermawez a 1404 a Rojî**

## Peyama pîrozbahiya Hizba Dêmokrat bo kongireya yekem a Federasiyona Jinên diyaspora ya Kurdistanî




**Jinên xebatkar û azadîxwaz!**

**Beşdarbûyên rêzdar ên Kongirê!**

Li ser navê Komîteya Pêwendiyên Îranî û Kurdistanî a Derveyî Welat a Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ve, em gerimtirîn pîrozbahiyên xwe bi hilkefta lidarxistina yekem Kongireya rêkxirav we, pêşkêşî we hemû rêzdaran û bi rêya we jî pêşkêş bi wan hemû jinên hişyar û mafxwaz dikin ku li pêxema bidestveanîna vekhevî û dadperweriyê, tekoşînê dikin.

Herwisa bi rêya vê peyamê, bejna xwe li hember hewldan û mandîbûna we jinên têkoşerên Kurd ditewînin ku li derve wek balyoz û nûnerê dengê berheqe mafxwaziya netewa xwe, hewlê didin li asta navnetewî de li dijî yasayên kevneperestî û dagîrkarî û sitemê de bo nûneratîkirina tevgera pêşkevtinxwazaneya jinên bivêr ên Kurd li navxweyê welatê me de bibin tirîbûnek.

Tevî rola berçav a jinan li pêşxistina pêvajoya xebata rizgarîxwazane ya netewa me li berê de, bo hemû aliyekê rohn û eşkere ye ku li serdema niha de jî, pêvajoya xebata wan, çi pêşkevtinek lezgîn bi xwe ve dîtiye û tevgera jinan çi roleke berçav û bê mînak li guherînên siyasî, mirovî û civakiyên vê serdemê de hene.

Jin bi sedema vê yekê ku zêdetir ji hemû qatên din ên civakê digel givaş û bidûrragirtin û cudatîdanînan rûberû bûne, li serdema şoreşa zaniyariyê de bi bilindbûna asta rewşenbîrî û têgihîştina wan bo pêwendiyên serdest li cîhana îro de, li rêza herî pêşî ya her tevger û çalakiyekê de ne ku armanca azadî, vekhevî û nehîştina binyatî ya sitem, nezanî û cudatîdanînan li pêşt be.

Beşdariya çalakaneya jinan û keçên dilsoz ên netewa me li refên hêzên Pêşmerge û tevlîbûna rû bi zêdebûna wan bi têkoşerên Çiya li wan salên dawiyê ji aliyekê û amara beşdariya pêşenganeya jinên bivêr li şoreşa Jînayê de li xwenîşandanên ser şeqaman de ku reftara tund a hêzên tepeserker ên komara îslamiya Îranê û qurbanîdaneke bê mînak a jinan li pey xwe anî, bû sedema vê ku dirûşma bingehîn a şoreşa Jînayê bibe "Jin Jiyan Azadî" û her bi vê rêyê, cîhan vê carê, bi çavê nasîna nû û modern ve mêzeyî pirsa Kurd û daxwaziyên mirovî yên netewa me bike.

**Rêzdaran!**

Bi hizra me, lidarxistina Kongireya we li rewşeke wiha de karek bi cî û li dema xwe de bersivdaneke hişmendane bi hewcehiyên xebata jinên netewa me ye ku dikare alîkarê bilintirkirina rol û pêgeha jinê li pirsên siyasî û civakî de be û bê şik û guman li berjewendiya giştî ya xebata vekhewîxwazaneya mirov bi giştî û xebata rewaya Kurd bi taybet de be.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li vê derheqê de xwe bi hevxebatê ve dizane û piştevaniya hemûaliya xwe bo hewldan û çalakiyên we radigehîne.

Herwisa em hewldan û mandîbûna ve li pêxema xizmetkirin bi pirsa jin û doza netewa me de bi bilind dinirxînin û Kongireya ve bi pêngawek pîroz û pêşkevtinek girîng dizanin.

Li dawiyê de careke din bi hilkefta lidarxistina Kongireya yekem a Federasiyona Jinên Diyasporaya Kurdistanî li we pîroz dikin û hivya serkevtinê bo we dixwazin

**Her bijîn û serkevtî bin**

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Kumîteya Pêwendiyên Îranî û Kurdistanî a Derveyî Welat**

**Kanûna Pêşîn a 2025**



# Pêşmergeyê Kurdistanê, hêza Kurdî û binavûdengê cîhanî



N. Serbest urmiye



**Pêşgotin**

Peyva "Pêşmerge" di Kurdî de tê wateya "kesê ku ber bi mirinê ve diçe", pênaseyek ku berfirehtir ji nasnaveke leşkirî, wateyeke kûr ji felsefe, exlaq û hebûnê hildigire.

Êdî ji Pêşmergeyê Kurdistanê bi tenê weke sembola têkoşîna neteweyekê ji bo hebûn, azadî û parastina rûmeta mirovan nahê mêze kirin, belkû di çarçoveya guhertin û pêkhateyên cîhanî de weke mijarek navneteweyî ya balkeş û xwedi pêgeh tê şirovekirin.

Di wir de hewl tê dayîn ku di bin siya hizr û felsefeyên cîhanî de pêgeha Pêşmerge ji hêzeke herêmî ve bo têgehek cîhanî û tevalî ve were şirovekirin.

**Pêşmerge û Felsefeya hebûnê (Ekzistansiyalîsm): Hilbijartina bi zanebûn a Mirina di rêya Azadiyê de.**

Di felsefeya hebûn(ekzistansiyalîsm) ê de, nemaze di hizra "Jean-Paul Sartre" de, mirov mehkûmê azadiyê ye, bi vê wateyê ku berpirsiyarê hemû hilbijartinên xwe ye di her rewşekê de, hetta di rewşa bindestî û tundûtûjiyê de jî.

Pêşmerge mînakek zelal a vê ramanê ye: Ew one bi neçarî, belkû bi zanebûn rêya xebat û tekoşînê hildibijêre. Pejiriandina dilxwaz a mirina di rêya azadiyê de, Pêşmerge weke pêdiviyekê bo hebûnê pênase dike ku hebûna wî di derwestbûna exlaqî bi azadiya giştî re tê nîqaş kirin.

**Pêşmerge di şiroveya Felsefeya Exlaqî de**

"Immanuel Kant" di felsefeya xwe ya exlaqî de, rûmeta mirovan, armanca dawîn û neguher dide zanîn û her cure bi emrazkirina mirovan red dike. Li gor vê ramanê jî, Pêşmerge xwedî meşrûiyeta exlaqî ye.

Ji ber ku ew ji bo parastina rûmeta mirovan û xelkê sivîl li hember hemû terzên zordarî û çewisandina sîstematîk de şer dike.

Lewma bihêztir ji hêza leşkirî a şerker, Pêşmergeyê Kurdistanê li gorî rola xwe ya dîrokî, hêza parastin û exlaq tê nasandin. Ev prensîpa bihêz jî pêgeha Pêşmerge di hizir û raya giştî ya navneteweyî de, ne wekî hêzek milîşiya, belkû wekî hêza parastina azadî û kerameta mirovan dide zanîn.

**Pêşmerge û ramana Berxwedan û desthilatê(hejmûnî):**

Têgeha desthilatê(hejmûnî) di hizra "Antonio Gramsci" de tenê hêza leşkirî ji xwe nagire, belkû di baweriya wî de aliyên gotar û çandî jî digire. Pêşmerge ne tenê şerê çekdariyê meşandiye û dimeşîne.

Berevajî, bi parastina ziman, çand, dîrok û gotara Kurdî li dijî desthilata dewletdariyê ya ku hebûna wî weke netewe înkar dike, sekiniye. Li gor vê ditingehê jî Pêşmerge pênaseya kesayetiyeke siyasî, çandî û neteweyî ye ku xebat û berxwedana wî dibe hêmaya berxwedana neteweyekê.




**Pêşmerge û Teoriya Dewlet - Netewe di hizra serdem de**

Di teoriyên dewlet - netewe yên klasîk de "Max Weber" û "Thomas Hobbes", ji dewletê weke desthilata yekemîn mêzê dikin ku xwedî mafê yasayî yê bikaranîna zordestî û tundûtûjiyê ye. Lê, ezmûna Kurdistanê ew rasî da selimandin ku di nebûna dewleteke de ku nûneratetiya neteweya xwe bike(dewlet – netewe), berxwedana çekdarî dikare pêgeh û meşrûiyeta civakî û exlaqî hebe.

Di vir de ye ku ji girîngiya xebata Pêşmerge di çarçoveya teorî û ramanên nû yên mafê neteweyan de bo diyarkirina çarenivîsasa xwe (li gorî carnameya Neteweyên Yekbûyî), tê fêm kirin û ji çarçoveya hêzeke herêmî de derdikeve û weke rastiyeke rewa ya navneteweyî tê diyarkirin.

**Cîhanîbûna rûmetê Pêşmerge: Ji Çiya û bajarên ve heta Medyayên cîhanî**

Di dîroka xebata hemdemî ya Pêşmerge de û bi taybetî piştî şerê Pêşmerge li dijî DAIŞê, wêne û rûmeta Pêşmerge wekî parêzvanekî maf û kerameta mirovan di gotar û şîroveyên siyasî û jeopolîtîk ên cîhanê de, roj bi roj girîngî jê re hate dayîn û di medyayên cîhanî de derket.

Vê yekê rol û rûmeta rastîn a Pêşmerge da xuyakirin û ji nû ve Pêşmerge weke semboleke cîhanî bo berxwedanê li dijî destekên serberedayî û sîstem û siyasetên ji holêrakirina çand û nasnameyan, pênase kir.

Li gor vê çendê mirov dikare balê bikişîne ser teoriya "hêza sembolîk" a "Pierre Bourdieu" û li gor ramana wî bêje ku Pêşmerge berhevkare sermayeyeke sembolîk e ku li derveyî sînorên Kurdistanê jî heman wate û bihayê dide tekoşîna Pêşmerge ku gelê Kurduistanê pê serbilind e.

**Encam**

Pêşmerge di Kurdistanê de ne tenê hêzek leşkerî ye, belkû têgeheke felsefî, exlaqî û siyasî ye. Hilbijartina hişmend û bi zanebûn a azadî û mirin di rêya azadiyê de ye. Ew parêzvanê nasname û rûmeta mirovan e û bi şerê li dijî desthilatdarên tepesserkar, dengê neteweya xwe ji bo bi destveanîna mafê çarenivîsasê bilind dike.

Ji ber vê yekê, her çend ku "Pêşmerge" hêzeke Kurdî jî be, lê xwedî û hilgirê wateyeke piralî ya cihanî ye. Wateyek ku li kêlega sembolên din ên neteweyî û dîrokî yên berxwedan û azadiyê de, di hizir û ramanên civaka mirovan de cih girtiye.

# Şeva Yeldayê, Zayîna Ronahiyê, jidayîkbûna şehîd Dr. Qasimlo



N. Hesen Mukerem




Di çanda Kurdî de, Şeva Yeldayê di heman demê de sembola serkeftina ronahîyê li ser tarîtiyê û destpêka rojvegera zivistanê ye. Ji bo Kurdan, ew xwedî wateyek kûr a rîtuelî, çandî û kolektîf e.

Jidayikbûna şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo di şeveke wiha de vê sembolê bi awayeke xweşik bi ramana aştî, edalet û wekheviyê ve girêdide, û her wiha di bîra neteweyî ya Kurdan de aliyeke siyasî-dîrokî dide Yeldayê.

Yelda di çand û erdnîgariya Kurdan de

Li Kurdistanê, Yelda bi navên weke "Şev Çile" û "Şeva Zivistanê" tê zanîn û di salnameya biyo-çandî ya Zagrosê de weke destpêka çilê mezin û demsala zivistanê tê hesibandin.

Li gorî ezmûna dirêj a cotkar û heyvandaran, ev şev demek e ku mirov şeva herî dirêj a salê derbas bike û hêvî bike ku ronahî û germahî zêdetir bibe, û ji ber vê sedemê di çanda Kurdî de curek pîrozî û rêzgirtinê bi dest xistiye.

Rîtûel û sembolên Şev Çile li gelek bajar û gundên Kurdistanê, malbat û xizm pêşwext hevrêz dikin ka dê di mala kîjan mezinên malbatê de di wê şeva çile ya wê salê de" bicivin, û ev kombûn bingeha rêûresma Yeldayê ye.

Sifreya vê şevê bi gelemperî tijî fêkî û xwarinên bi rehên kevnar e: ji zebeş û hinarê bigire heya "kalk torş" (xavîya tirş), ava tirî, mireba hinarê, dolma û nan û berhemên herêmî, ku her yek ji wan sembola bereket, tenduristî û aramiyê di zivistana sar de ye.

Çîrokvegotin, xwendina Şahnameyê, û vegotina nasnameyê Piştî xwarina nan û xwêya hevpar, Yelda li Kurdistanê dibe qadeke zindî ya çîrokvegotin û veguhestina bîra kolektîf, mezinên malbatê, metelok, efsane û çîrokên şer ji zarok û ciwanan re vedibêjin.

Li hin herêman, xwendina Şahnameyê, xwendina kronîkên şerê Kurdan, û çîrokên weke "Xatûn Zemhirîr" û vegotinên din şevê heta sibehê dişopînin, û dema nifşê ciwan kêfxweş dikin, dîrok, ziman û nirxên kolektîf ji wan re vedibêjin.

Jidayikbûna Qasimlo, Ji Şeva herî dirêj ber bi asoya Aştiyê Ebdulrehman Qasimlo li Urmiyê di şeva Yeldayê ya sala 1309an a Rojî de ji dayik bûye, şevek ku di bîra Îranî û Kurdan de weke şeva herî dirêj a salê û ber deriyê sibehek nû tê zanîn.

Ev hevrêzî, di vegotina sembolîk a jiyana wî de, weke jidayikbûna ronahiyê di dilê tariyê de tê fêmkirin, mirovekî ku paşê beşa herî mezin a jiyana xwe ji bo têkoşîna rêxistinkirî ji bo mafên neteweyî ye Kurdan, edaleta civakî û demokrasiyê terxan kir.

Dr.Qasimlû, wekî Sikirtêrê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê di salên piştî şoreşa 1979an a Zayînî de, ku jiyanek di xizmeta wekhevî û edaletê de derbas kir, karî hêzên Pêşmerge û rêzek fireh ji Kurdan li dora daxwaza, mafên neteweyî û demokrasiyê seferber bike û di siyaseta Kurdî û dijberiya Îranê de, bû kesayetek karîzmatîk û navneteweyî.

Ji bilî ezmûna xwe ya di têkoşîna çekdarî de, ew di warê dîplomasî û diyalogê de jî çalak bû, û hewl da ku çareseriyên siyasî, federal û li ser bingeha mafên mirovan ji bo pirsgirêka Kurd li Îranê li ser astên herêmî û Ewropî pêşniyar bike.



Maseya danûstandinan ku veguherî qada terorê di dawiyê de di 13ê Tîrmeha 1989an a Zayînî de bi destên bi nav dîplomatên rejîma Îranê hate terorkirin, dema ku şehîd Dr.Qasimlo li Viyanayê, paytexta Awistiryayê, bi nav nûnerên fermî yên Komara Îslamî re danûstandinan dikir da ku çareseriyek aştiyane ji bo pirsa Kurd bibînin.

Ev teror, ku weke terorîzma dewletê hatiye binavkirin, ne tenê sembola tundûtûjiya rejîma Pehlewî û dû re jî ya Komara Îslamî li dijî daxwazên wekheviyê yên Kurdan e, lê di heman demê de, di bîra kolektîf a Kurdan de, li Ewropayê Yeldayek din a xwîn û bêdengiya dadwerî nîşan da, ku birîna wê heta roja îro jî necebiriye.

Girêdana sembolîk a Yeldayê, Dr.Qasimlo û hêviya Kurdan Ji bo gelek Kurdan, Şeva Yeldayê ji pîrozbahiyek demsalî wêdetir çûye da ku jidayikbûna rêber û ramanwerekî ku bi salan ji serdema xwe pêşdetir bû û li aştiyek dadperwer digeriya bi bîr bîne.

Bi vî awayî, ronahiya ku piştî şeva herî dirêj a salê hildiweşe, di xeyala kolektîf a Kurdan de bi xewna neqediyayî ya Qasimlo ya wekhevî, demokrasî û naskirina mafên neteweyî yên Kurdan ve girêdayî ye, xewnek ku her sal ji nû ve tê dubare kirin dema ku çira tênê vêxistin û malbat li hewşê dicivin.

# Şivan Perwer, Dengê ku dîrok şiyar kir
## Bi boneya pêncî saliya çirûskîna li asîmanê hunera Kurdistanê



**N. Mecîd Heqî**



**Beşa 1**

**Pêşgotin: Senfoniya ba û kevir**

Bayekî sar ji çiyayên Qerejdaxê li deştên Cizîr û Wêranşarê dihat. Gundê piçûk, bêdeng û kerr, di nav çiyayan de winda bibû, ku weke hezar sal bûn tiştek ji bilî hûjîna bayê û ahenga hov a xwezayê nebihîstibûn. Di vê bêdengiya giran de, kurek bi porê tevlîhev, rûyê ji ber tavê şewitî û nêrîneke ku kûrahiya wê ji temenê wî mezintir bû, li pişta dîwarekî herî rûniştibû. Ew bi darikekî zirav li kevirekî dixist. Rîtmeke sade, seretayî, lê bi pergal.

Diya wî ji pişt pencereyê li wî dinêrî û kenek veşartî li ser lêvên wê hebû. Ne ew û ne jî kesekî din li wî gundî nedizanîn ku ev lêdanên sade yên li ser kevir, amadekariyek bûn ji bo şikandina bêdengiya sedsalekê. Kesî nedizanî ku ew kurê ku nawê wî "Îsmaîl", bû paşê cîhan jêre bêje Şiwan û dê qirika xwe bike çekek ku ji hemû topxaneyên artêşên Rojhilata Navîn bi hêztir be.

Çend dehsal şûnda, heman kurik, niha bi rûyekî ku şopa salên xerîbî û têkoşînê li ser heye, li ser şanoyekê di dilê Ewropayê de rawestiyaye. Salon di tariyê de ma ye, lê hezaran çavên bi hêstir di ronahiya dikê de dibiriqin. Dema ku ew diqîre "Kîne Em?", çiyayên Kurdistanê di salona konserê ya Berlîn, Stockholm, Londra an Parîsê de amade dibin. Dîrok ji xew şiyar dibe û ew gelê ku nexşeyên siyasî yên cîhanê hewl didan wan înkar bikin, bi yek dengî diqîrin: "Emin em Kurd in".

Ev çîroka Şivan Perwer e, lê ne tenê çîroka stranbêjekî ye. Ev çîroka girêdana navbera felsefeya sedsala hijdehan, rojnamevaniya sedsala nozdehan û muzîka protest a sedsala bîstan e.

**Perdê Yekem: Serdema Înkarê, Gava ku bêdengî jî siyasî bû**

Ji bo fêmkirina mezinahiya karê ku Şivan Perwer kirî, berî her tiştî divê mirov "zemîne"yê nas bike, zemîneyeke ku tê de ne tenê deng, belku navê "Kurd" bi xwe jî dihat înkarkirin. Şivan di demeke wisa de derket holê ku li Tirkiyeya Komarxwaz, peyva "Kurd" bi awayekî fermî tunebû. Gotara Kemalîst, Kurd wekî "Tirkên Çiyayî" bi nav dikirin, gelên ku li gorî vegotina fermî, zimanê wan ne zimanekî dîrokî, belkî koma dengên xwezayê bû "qart-qurt"a berfê ya di bin lingan de. Înkarkirina nasnameyê, ne li qeraxê, belkî di navenda siyasetê de cih girtibû û bibû îdeolojiya fermî ya dewletê.

Di salên 1960 û 1970yî de, axaftina bi Kurdî li cihên giştî dikaribû biba sedema cezayê pereyan an jî şopandina qanûnî. Stranbêjiya bi Kurdî wekî sûçekî ewlehiyê dihat dîtin. Navên Kurdî ji bo zarokan qedexe bûn û nasnameya qewmî ber bi qada taybet ve dihat dehfandin.

Di rewşeke wiha de, çanda Kurdî ne li pirtûkxane û zanîngehan, belkî di kûrahiya malan, şevbêrkan û bi veguhestina sîng-bi-sîng zindî dima, cihê ku "dengbêj" çîrokbêjên stranbêj bibûn parêzvanên dawî yên bîra civakî.

Lê dengbêjiya kevneşopî, ligel hemû nirxa xwe ya dîrokî, pir caran vebêjerê evînên herêmî an şerên eşîrî bû. Civaka Kurd, di rûbirûbûna cîhana nûjen û nîzama nû ya netewedewletan de, pêdivî bi tiştekî zêdetir hebû, dengek ku vê belavbûnê bike vegotineke hevpar, nasnameyek ku ji asta olî û bîranînên herêmî derbas bibe û ber bi "nasnameya neteweyî ya nûjen" ve biçe.

Tam di vê qelîşka dîrokî de ye ku girîngiya Şivan Perwer wekî xeleka pêywendiya çend sedsalên têkoşîna çandî derdikeve holê.

Sedsala bîstemîn ji bo Kurdan, sedsala netewe-dewletên nû bû, dewletên ku li ser kavilên împaratoriya Osmanî û Qacar hatibûn avakirin û pir caran, siyasetên xwe li ser bingeha "neteweyeke fermî" û çendîn "neteweyên înkarkirî" ava kiribûn.

Tirkiyeya Komarxwaz, Iraq a Baasî, Sûriyeya di bin mandateriyê û piştre Partiya Baasê de, û Îrana Pehlewî û piştî wê Komara Îslamî, hemûyan, bi tundî û şêwazên cûda, projeyên sîstematîk ji bo yeksankirina zimanî û çandî meşandin.

Li Tirkiyeyê, zimanê Kurdî bi dehan salan ji dibistan, radyo, televîzyon û qada giştî hatibû derxistin. Bikaranîna Kurdî li qada giştî dikaribû wekî sûç were hesibandin. Rewşeke heman, bi formên cûrbecûr, li Iraq û Sûriyeyê jî dubare bû.

Di cîhaneke wiha de, bêdengî bixwe veguherî çalakiyeke siyasî, ku tu neaxivî, ku tu bi zimanê xwe yê dayikê stranê nebêjî, ku tu navê zarokê xwe biguherînî, hemû beşek ji wê "nasnameya jorîn" bûn ku ji jor ve dihat ferzkirin û ferd neçar dikir ku ji bo man û nemanê, ji xwe dûr bikeve.

Lê di binê vê mîmariya bêdengiyê de, jiyan berdewam dikir. Li gundan, malan û civatên piçûk, zimanê Kurdî hîn bêhn distand. Amûrên sade, stranên kevin û dengên herêmî, bibûn çeperên dawî yên nasnameyê.

Ev çeperê ku di xuyanê de sînorkirî û bêdeng bû, piştre bi destê Şivan Perwer, ji jêrzemînê derbasî qadekî berfireh û cîhanî bû, ji pistepistê ber bi qîrînê ve, û ji manê ber bi hebûnê ve.

Di bîstreke wiha de, Şivan Perwer ne tenê stranbêjek, belku bersiveke dîrokî bû ji bo serdemeke înkarê. Ew di demekê de stra ku stranbêjî sûç bû, bi zimanekî stra ku ziman nedihat hesibandin, û bi vê hilbijartina bi zanebûn, bêdengiya ferzkirî şikand û ew veguherand deng, vegotin, bîr û nasnameyê.

Şivan Perwer, berî ku hunermend be, kêliyek dîrokî bû: kêliya ku bêdengî hilweşiya û deng, careke din derfeta "bûn"ê peyda kir.




## Nerîna



**“Mezlûm Ebdî”:**

**“ 2026 ji bo Rojavayê Kurdistanê destpêkeke nû ye, Hêzên Amerîkayê li Hewlêrê ji nû ve bi cih dibin. ŞopaÎranê niha kêmtir e.**
**Her çend Îran niha lawaztir be jî hîn hewl dide komên wekîl (proxy) ava bike.”**



**“Vladimir Putin”:**

**“Ger 1 li ser 3 a axa Ukraynê bi me nedin, şer dê berdewam be.”**



**“Donald Trump”:**

**“Divê hemû welat li dijî terorîzma Îslamî bibin yek.”**



**“Benjamin Netanyahu” :**

**“Şerê Îsraîlê li dijî mihwera xerabiya îranê ji bo domandina jiyana Cihûyan û parastina şaristaniya Cihû-Mesîhî pir girîng e.”**

# Berhema 80 salî ya Hizba Dêmokrat ji bo Kurdan, 26›ê Sermawezê!



**N. Eskender Ceiferî**




Roja Pêşmergeyên Kurdistanê bû. 26’ê Sermawezê heman roj e ku ji bo Kurdan bûye dîrokeke tijî şanazî.
Roja 22’ê Kanûna Paşîn a sala 1946’an a Zayînî angu 2’ê Rêbendanê ya sala 1324’an a Rojî, Komara Kurdistanê ji aliyê Pêşewa Qazî Mihemed ve li meydana Çarçira li bajarê Mehabadê li Rojhilatê Kurdistanê hate ragihandin û wê hikûmeta Kurdî, ala netewî ya Kurdistanê hilda. Di vê rêwresmê de Qazî Mihemed wiha sond xwar: “Bi mezinatiya Xwedê, rûmeta Qurana Kerîm û li ser welat û ala xwe sondê dixom heta dilopa dawî ya xwîna min û nefesa min a dawiyê, bi can û malê xwe, di rêya azadiyê de, ji bo ku ala me li esman pêl bidin, ezê xebatê bikim.”
Li wir di 26’ê Sermawezê de ala Kurdistanê ji bo cara yekemîn ji aliyê pêşmerge ve hate hildan û ew roj, bû beşek ji dîroka Kurdan.
Niha li Kurdistanê piştî 80 salan, bi berdewamiya şoreşa Jînayê, heman deng li dijî dagirkariya Tehranê tê hildan. Dengê mafxwaziya Kurdan û dengê Komara Kurdistanê tê bihîstin. Komar, ji aliyê heman partiyê ve hate avakirin ku niha jî piştî vê dîroka dirêj, hîn di xebatê de berdewam e û bûye cihê şanaziya Kurdan.
Beriya wê jî li vê navçeyê serhildanên Şêx Ubeydullayê Nehrî û Simkoyê Şikak çê bibûn.
Piştî ku sala 1941’ê Şahê Farsan, Riza Şah bi derbeyekê ket û kurê wî Mihemedriza bû desthilatdarê rêjîmê, wê demê serokeşîrên Kurdan ên ku ji Kurdistanê hatibûn dûrxistin , zivirîn Kurdistanê û hewl didan desthilat û rêveberiya navçeyên xwe bi dest bigirin.
Êdî parek ji axa Rojhilatê Kurdistanê ketibû bin desthilata Kurdan û nawçên Azeriyan jî Tewrêz û derdora wê ketibûne bi desthilata Azeriyan de û Rûs jî derbasî navçeyê bibûn.
Sala 1942’an li Mahabadê kovara bi navê Nîştiman bi beşdarbûna 11 kesan hate weşandin û weke rojnameya fermî ya Komeley Jiyanewey Kurd (Komeley J.K) hate binavkirin û li ser hesta netewî ya Kurdan kar dikir. Navê vê komeleyê dihate wateya vejandina Kurdan. Piştî 3 salan di sala 1945’an de bi pêşengiya Qazî Mihemed, Komeleyê dewsa xwe da Hizba Dêmokrat a Kurdistanê û daxwazên vê partiyê, xweserî, perwerdeya bi zimanê dayîkê, fermîbûna zimanê Kurdî û gelek xwestekên din jî bûn.
Ji bilî Komara Agirî li Bakur û hikûmeta Şex Mehmûd Berzencî ku li Silêmaniyê hatibû ragihandin, Komara Kurdistanê jî di warê dewletbûnê de ji bo Kurdan bû ezmûneke din. Kurdan êdî ji xwe re şoreşên Agirî, Simko û yên din kiribûn mînak û waneya berxwedanê ji wan hîn bibûn.
Piştî ku di 22’ê Kanûna Paşîn a1946’an Komara Kurdistanê hate ragihandin, Leşkerê Kurdistanê angu Artêşa Kurdistanê hate avakirin ku heman Hêza Pêşmerge bû. Ew hêz ji hezaran gencên Kurd û ji leşker û hêzên wan eşîran pêk dihat ku tevlî Komara Kurdistanê bibûn û her du hêzên siwar û peya lixwe digirtin.
Komara Kurdistanê ya ku li Mehabadê bi Serokkomariya Qazî Mihemed hate ragihandin, 14 wezîr jî lixwe digirtin ku ev in, Serokwezîr: Hacî Baba Şêx, Wezîrê Karûbarên Navxwe: Mihemed Emîn Muînî, Wezîrê Karûbarên Derve: Ebdulrehman Îlxanîzade, Wezîrê Şer û Parastinê: Seyf Qazî, Wezîrê Darayiyê: Ehmed Êlahî, Wezîrê Dadê: Mela Husên Mecdî, Wezîrê Rêûbanan: Îsmaîl Îlxanîzade, Wezîrê Ragihandinê: Sidîq Heyderî, Wezîrê Post, Telefon û Telegrafê: Kerîm Ehmedeyn, Wezîrê Perwerdehî û Fêrkirinê: Menaf Kerîmî, Wezîrê Kar: Xelîl Xûsrewî, Wezîrê Ticaret û Bazirganiyê: Hecî Mistefa Dawûdî, Wezîrê Tenduristiyê: Seyîd Mihemed Eyûbiyan, Wezîrê Çandiniyê: Mehmûd Welîzade. Wan wezîran, yasaya Komarê zelal kirin.

Di dema yazde mehên temenê Komara Kurdistanê de gelek rêxistinên aborî, leşkerî, civakî, sîstema perwerdehiyê, çandî, wêjeyî, hunerî, şanoya Kurdî, saziyên ji bo parastina mafên jinan jî hatin pêkanîn, çapemenî hebûn û zimanê Kurdî jî bû zimanê fermî. Ev berhem û gelek berhemên din û herwisa Hizba Dêmokrat a Kurdistanê, ji mîratên Komara Kurdistanê ne ku heya îro jî li dijî dagirker xebatê dike.
Aboriya Komara Kurdistanê li ser bac û ticaretê birêve diçû bi rengekî ku komîsyonekê li navendên bajaran bac ji tacir û bazirganan distand û komîsyonekê jî di rêya axayan re baca gundewaran kom dikir. Herwisa Komara Kurdistanê bixwe jî çalakiyê bazirganî û ticaret dikir ji bo ku dahata pêwîst ji bo xercên hikûmetê bi dest xwe ve bîne.
Hêzên Rêjîma Şayê Farsan, bi desteka Brîtanyayê di roja 17’ê Kanûna 1946’an de, leşkerên xwe birin aliyê Kurdistanê. Ji bo ku xelk neyê komkujkirin, Qazî Mihemed, berdewamkirina riya xwe, sparte hevalên xwe û êdî komar hate hilweşandin û Qazî Mihemed xwe radest kir.
Ji bilî desteka Brîtanya, Sovyetê jî bi Îranê re lihev kiribû ku pêwendiyên wan ên aborî bi rêjîma Şahê Farsan re berdewam bikin û di lihevhatina wan de hatibû destnîşankirin ku “Mijarên Azerbaycan û Kurdistanê, pirsgirêkên navxwe ne û Îran divê bixwe, van pirsgirêkan çareser bike û êdî Sovyet piştgiriyê nade van neyarên Îranê. Herwisa êdî hêzên Sovyetê û ên Birîtaniya jî, ji axa Îranê bi temamî vedikişiyan.”

Di roja 31’ê Adarê a sala 1947’an a Zayînî de Pêşewa Qazî Mihemed serokkomarê Kurdistanê, Seyf Qazî wezîrê Şer û Parastinê yê Komarê û birayê wî Sedr Qazî li meydana Çarçira ya Mehabadê hatin darvekirin lê rêbaz û çepera wan, heya niha jî her didome û bûye şanaziya Kurdan.
Piştî 80 salan, dunya hatiye guhertin. Lê tişta ku qet nayê guhertin, dengê şoreş û serhildana Kurdan li dijî dagirkar û berdewamiya vê xebatê ye ku di 26’ê Sermawezê de deng veda.

# Şivan Perwer: Pêşmerge berevankar û parêzerê civak, welat û hebûna meye lewma dive pêşmerge netewî be



**Bi hilkefta 26ê Sermawezê roja Pêşmerge û Ala ya Kurdistanê hevpeyvîna vê carê digel hunermend Şiwan Perwer hatiye kirin.**

**Hevpeywînkar – Şehram Subhanî**

**Têkst wergirtin ji deng – Sîmîn Rûhanîzade**

**Pirsyar - Mamoste bi vê pirisê emê destpê bikin, Stranên we bûne beşek ji bîranînên gelê Kurd, ku amaje bi tirajîdiya û berxwedana gelê Kurd dikin hûn rola Pêşmerge di wan bîranînan de çawa dibînin? Pêşmerge tenê aktoreke dîrokî ye yan parêzvanê vê bîranînê ye?**

Bersiva Şivan Perwer - Navê Pêşmerge tê naskirin, Pêşmerge navekî taybet bi gelê Kurd e. Çawa ku Spaniyayê nave Gerîlayê li tevahiya cîhanê de dane naskirin, pêşmerge jî berhema Kurdan e û wiha tê naskirin li Kurdistanê, ji bilî navê pêşmerge navekî din nîne û eger em bibêjin leşker , kes wê qebûl nake. Ji ber ku me xizmet û hêz û fedakariya pêşmergeyan dîtiye û ev yek ji bo gelê Kurdistanê sembola nav û serbilindiya Kurdan e û bi wan taybetmendiyane ku Pêşmerge bo me navek pîroz e.

**Pirsyar - Piraniya dîroka qehremaniya Pêşmergeyan bi stran û sirûdan ve hatiye vegotin bi nêrîna te ew vegotina hunerî çiqa kariye dîroka rast ya Pêşmerge biparêze?**

Bersiv - Dema ku basa hunerê tê kirin, huner dengê xwezayê ye û her jîndarek di xwezayê de xwedî dengê xwe ye û di tevahiya xwezayê de mirov jîndarek kultûrî ye muzîk û huner dengên pêvaneyî ne, ji ber vê yekê her bûyer an karesateke ku di jiyana kesekî de diqewime di civakê de bi rêya muzîkê tê derbirîn muzîk moral, hêviya mirovan zêde dike û hezkirinê çêdike.

Divê hezkerê jiyan, xweza û Kurdistanê bî, dive hezkerê Pêşmerge bî, li wirdaye ku ev muzîk û sitiranên ku di vî warî de hatine tomarkirin ji serdemê kilasîk heta niha li ti welatekê dine berhem ne hatine. Bi derbasbûna sedan salan ji dagirkirin û parçekirina Kurdistanê, gelê Kurd her tim têkoşiya, şehîd daye, êş kişandiye û qehremantî nîşan daye û tevî hebûna van êş û azaran lê muzîk tomar kiriye. Eva jî bûye sedema pêşketina muzîkê û rola muzîkê di jiyana gelê Kurd de.

**Pirsyar - Erk û rola pêşmerge çi ye? Gelo çawa dikarîn wêneya pêşmerge di asta navnetewî de zêdetir bihêz bikin ?**

Bersiv - Her qehremanek ku xwe amade neke bi ser nekeve. Pêşmerge tenê navek nîne ku bi hêsanî bikarîn li ser bas bikin, Pêşmerge berhema xebata û berxwedan li demên dijwar e, ji ber vê yekê li seranserê cîhanê hatiye naskirin. Wate Hêza pêşmergeyan hêzeke naskirî ye.

Wê demê têkoşîn û fedakariya pêşmergeyan bi hêza siyasî ya Kurdistanê ve girêdayî ye û divê baş bê rêxistinkirin, wê demê têkoşîn û fedakariya pêşmergeyan bi hêza siyasî ya Kurdistanê ve girêdayî ye û divê baş bê rêxistinkirin ku heger hêzên siyasî yên Kurdistanê bi awayekî herî baş amade û birêxistin bin, pêşmerge dê bikaribin bibin hêzeke bergirîkarê cîhanî, Bifikirin dema "Daiş" serhilda ger hêza pêşmerge neba eva dê biba metirsiyek bo ser tev cîhanê, Lê hêza pêşmerge bû ku karîn Daiş bîxne qedema û ji ber vê yekê hêza pêşmerge ji tevahiya cîhanê re eşkere bû û hat naskirin.

**Pirsyar - Dema ku tu sitiranan dibêjî li ser ekranên mezin yên cîhanê, dixwazî li ser Pêşmerge û doza Kurd çi bigehînî guhê xelkê biyanî?**

Bersiv - Jiyan felsefeyek e û di hemû alî û rehendên jiyanê de rengîniya felsefeyê derdikeve, pêşmergayetî jî felsefeyek e wekî ku min berê jî got, ku hêza pêşmerge bû ku karî Daişê teslîm bike cîhanê çend alîkariya hêza pêşmerge kir û buha da pêşmergan, eger pêdiviya pêşmergeyan bi alîkarî û hêzeke zêdetir hebe ew dikeve ser milên hêzên siyasî û dîplomasiya Kurdan her çiqas siyaset û dîplomasiya Kurdan li cîhanê bihêz be eva girîngiya hêzên pêşmergeyan ji cîhanê re diyar dibe û tê piştgirîkirin.

**Pirsyar - Piştî ewqas salên têkoşîn û hunerê gava hûn peyva "Pêşmerge" dibihîzin, dîmen an hesta ku dikeve dil û hişê te çi ye?**

Bersiv - Pêşmerge di gelek waran de têkoşîn kiriye Tevî ku wî qehremantî nîşan da jî, lê heta niha çekên hewce û grîng jêre nehatiye dan, gelek caran zarok û malbatên wan aware bûne, ev jî bûye pirsgirêkeke mezin ji bo têkoşîna pêşmergeyan. Herwisa Stranan bi baş anîne ziman û nîşan daye ku pêşmergeyan çi qas bi zehmetî xebat kiriye û bi kîjan îdeolojî û baweriyê dest bi şoreşê kirine.

Lê di warê siyaset û dîplomasiyê de me nekarî hêza Pêşmergeyan li gorî fedakarî û têkoşîna pêşmergeyan bi başî bidin nasandin. Ji ber vê yekê, pêwîst e ku hêza pêşmergeyan baştir were nasandin, ji ber ku hêza pêşmergeyan dîrok e, nasnameya kurd e, qehremantî û mirovahî ye.

Her rêberek pêşmergeyan ku dest bi şoreşê kir û şer kir gotiye aştî, dostayetî û mirovahiyê. Pêşmerge ne tenê hêzek e ku tenê bo şer û lêdana be. Pêşmerge ji bo xizmeta gelê xwe bi dijwarî têdikoşe. Her weha girîng e ku mirovdostî û têgehiştina pêşmerge ji aştî û azadî bê rohin kirin.

û berevajî tiştê ku dijminên gelê Kurd li dijî gelê Kurd kirine, pêşmerge ti,u carî alîgirê êrîş û dagirkirina mal û azadiya kesekî nebûye û tu carî nebûye alîgirê kuştina dîl û êxsîran, hêza pêşmerge hêza aştî û mirovahiyê ye û di heman demê de hêza parastina azadî û welat e.

**Pirsyar - Pêşmerge wek hêzeke neteweyî tê dîtin, em çawa dikarin wêneyek yekgirtî ya pêşmergeyan wek "parêzvanê nîştiman" nîşan bidin, ne wek parêzvanê partî û aliyekê?**

Bersiv - Huner her dem ziman, raman û dengê gel e û pareçe bûnê qebûl nake Wekî hunermendek, her strana ku ez dibêjim ji bo tevahiya welêt dibêjim. Lê ev di siyasetê de ne wisa ye, tê dabeşkirin û Siyaset şiroveya jiyanê ye. Her yek dibêje bi awayekî dê jiyanê baştir bike yek bi libralîzmê yek bi komonîzmê û yê din bi oldarî û yeke din dibêje bi konsêrvatîvê dê baştir bike .

Siyaset bi vî awayî dabeş dike. Bo nimûne, Pêşmergeyek bawerî bi komonîzimê heye û Pêşmergeyek bawerî bi oldar û ayînî heye, lê tevî wan cudahiyan her du jî Pêşmerge ne û dema ku ew li hev dicivin ew hev qebûl nakin eva berhema siyasetê ye û siyaset kêbirkêyê çê dike û ya baş eva ye ku siyaset bi her awayekî be hewla parçe parçekirina hêza Pêşmerge nede.

Li seranserê cîhanê ev yasaye he ye ku dibêje partî, siyaset û hikûmet ji bo xelkê ye, lê dive ji hêza leşkerî dûr be. Ji ber vê yekê divê siyaset tevlî hêza pêşmergeyan nebe û divê pêşmerge bi baweriyên netewî bên rêxistinkirin û ji çarçoveya fikir û baweriyan û partiyê de derkevin.

Niha ku ez hunermend im, ez dixwazim her kesî re bêjim ku, bila tu partî min dagir neke û divê tu partî pêşmergeyan dagir neke, mînak ger li vir pirsgirêkek hebe Pêşmergên Rojhilat jî dikare alîkariyê bike.

Dema ku Daiş hat an jî şerek rû li Kurdan de kir, divê hemû hêzên pêşmergeyan li wir amade bin. Divê em ji parçe parçekirina pêşmergeyan dest berdin. Pêşmerge parêzvan û berevankarê civak, welat û hebûna me ye, ger em mecbûr bimînin ku ji bo maf û azadiyên gel têbikoşin, wê demê nabe parçe parçr bin eva nahêlin em bihêz bin. Ji ber vê yekê divê pêşmerge neteweyî be.

**Spas mamoste Şivan Perwer bona bersivdana te û mandî nebî**

# Li ber deriyê dîrokê, pêwîstiya yekitiya neteweyî û hişmendiya milî



N. Cano Amedî

Di derbarê mijara yekitîyê de, dîroka me ya dused salên dawî bi alîyên xwe yên erênî û neyênî li ber çavan e! Ji ber ku di warê hişmendîya neteweyî de, di warê mafên miletbûnê û daxwazên desthilatdarîyê de problemên me yên bingehîn hene û di heman deman de wek qeydek asê dest û lingên me girêdaye, rê li ber asoya me ya neteweyî tarî kirîye û weke girêkek kor li ser serê me hatîye daliqandin.

Gelo ev rastîya hanê, ev girêka kor “qeder e” yan jî encama “bêtifaqî û nexweşîyek genetik e?” Sedemên vê nexweşîyê çiqas bi me ve girêdayî ye, çiqas ji derva de li ser me hatîye ferz kirin? Bersîva van pirsan di kûrahîya şert û mercên dused salên dawîyê de veşartîye. Gava ku em rûpelên dîrokê dizîvirînin, kezeba me dişewite, dilê me bi êş lêdide. Kêmasî û şaşîyên pêşîyên me, weke mîratek xirab barê me giran kirîye. Lê mixabin bê aqûbetî û bê tifaqîya doyîn, îro jî weke nexweşîyek genetik hebûna xwe didomîne.

Ji destpêka serhildana Şex Ubeydullah Nehrî bigre heta roja îro, hewldan û têkoşînên ji bo serxwebûna Kurdistanê hatine meşandin, rastî kelem û astengên dijwar bûne! Serhildan an jî hewldanên rizgarîya Kurdistanê, ji ber gelek sedemên cuda, ji ber şert û mercên demê, ji ber bêtifaqî û hewldanên herêmî, êrîş û destdirêjîya dijmîn, nakokî û pirsgirêkên navxoyî, kêmasîya hişmendîya miletbûnê, her yek jê bûye astengîyek cuda û rê li ber berbanga azadîyê asê kirine, gavên hewldanên nû dereng xistine.

Îro jî wan nexweşîyên doyîn, bi şêweyeke din hebûna xwe didomînin û rê li ber rizgarîya netewa Kurd asê dikin. Ji bo azadî û serxwebûna Kurdistanê, pêwîstîya miletê Kurd bi tifaq û hevkarîyên neteweyî heye. Ev pêwîstî do jî hebû, îro jî heye, wê sibê jî hebe! Do ji ber dîwarên îdeolojîk, ji ber rêxistinperestîyê, ji ber qûretî û bêhntengîya siyasî, ji ber bêtecrube û bê asoya milî, pêşengên me, sazî û dezgehên me, rêxistin û partîyên me bi ser neketin! Di warê tifaqa neteweyî de derfetên hebûn bi kar nenanîn û îro dibêjin: “Xwezîya wê demê, em bi ser biketina!” Belê, rast e, em îro baca wê sîyaseta biserneketî didin û di derbarê pêwîstîyê tifaqa neteweyî de hawar û qêrîn dikin. Lê mixabin ji ber hînbûnên me yên berê, ji ber nexweşîyên rêxistinî ku hişê me dîl girtîye, bi kurt û kurmancî ji ber karekterê îdeolojîk, ji ber sedemên bêtifaqîyê em îro jî dengê hevdû nabihîzin!

Dîrok şahid e ku miletên tifaq û yekrêzîya nav xwe pêk anîne biserketine û bûne xwedî dewlet, bûne desthilatdarên welatê xwe. Ev jî bi rê û rêbazên rêxistinî, bi hişmendîya neteweyî, li ser bingeha armancên sereke û yên stratejîk pêk hatîye.

Miletên bi hişmendîya yekîtîyê tevgerîyane îro di nava koma miletan de cîhê xwe girtine. Yên tifaqa xwe pêk nenanîn, di bin zilma dagirkerîyê de cirmên xwe didin. Miletê ku enerjîya xwe bi nakokîyên navxweyî û perçebûnê xerc dikin, cîhê wan li ser dika dîrokê tune ye û mehkûmê windakirinê ne!

Miletê Kurd, yek ji gelên qedîm ên Rojhilata Navîn e, ku di sedsala 21ê de, di nav rastiya erdnîgarîyeke parçekirî de, ji statûyek siyasî bêpar, li dijî dagirkerên hov ditêkoşe! Îro li seranserê dunyayê bayê siyaseta guhertin û hewldanên restorasyonên heremî û gelemperî desthilatdar e.

Di vê pêvajoyê de, ba û bahozên guhertinê wê bandorek çewa bi xwe re bîne, girêdayî berjewendî û sîyaseta dewletên mezin û helwesta miletê Kurd e. Ji bo miletê Kurd bigehîje mafên xwe yên neteweyî, siyasî û çandî, berîya her tiştî girêdayî tifaq û tekoşînek hevbeş ya yekîtîya Neteweyî ye. Kilîda destpêkê ya serkeftinê di kûrahîya aqlê kolektîf de veşartîye! Dîroka me ya nêzîk, daye îspat kirin ku yekîtîya miletê Kurd, jibo hebûna paşerojê pêwîstîyek jîndar û girîng e!

Yek ji astengîya herî mezin a siyaseta Kurd ew e ku di pêvajoya îroyin ya dîrokî de, ji dêvla em enerjîya xwe li hemberî dagirkeran xerc bikin, em dibînin ku zêdetir di reqabeta navxwoyî de xerc dikin. Di cîhana îroyin de têkilîyên navneteweyî, ne li ser hestiyarîyê ye, ev têkilî bi temamî li ser berjewendiyên milet û dewletan ava




bûye û bi vî rengî dimeşe. Hêzên desthilatdar gava ku miletekî muxatab digrin, li gel berjewendîyên xwe, li rastîya dengekî yekgirtî, stratejiîyeke zelal, li temsilkarîyeke neteweyî û li nûnertiyeke bi îstîqrar jî digerin.

Wêneya alîyên siyasî yên perçebûyî û dijberîya nevxweyî, faktorek herî mezin e ku destê Miletê Kurd li ser maseya dîplomasiyê qels dike. Heta ku hewldanek, sîwanek ji bo destkeftîyên neteweyî pêk neyê; serkeftinek mayînde an destkeftîyek bingehîn bidestxistin zehmet e! Girîngîya yekitîyê, ne tenê kombûna hêzên leşkerî û sîyasî ne; di heman demê de pêngava hilweşandina dîwar û bendavên derûnî ye jî.

Xalek din jî, gava bingeha yekîtiya neteweyî bête avakirin, divê di hişê mirovan de ji dêvla têgehîştina “em bi ser nakevin” an jî “emê bikevin qirika hev”, divê em di şûna vê nêrînê de baweriyeke kolektîf ava bikin. Realîta rizgarîya neteweyî, ne tenê bi azadkirina axê ve girêdayîye. Gava bi mejîyekî azad, daxwazên kolektîf, zimanekî dîyalogê û hişmendîya berjewendîyên “netewî” derkeve pêş, serkeftin pêkan e.

Yekitî, nayê wê wateyê ku her kes di heman partiyê de cîh bigre, heman îdeolojiyê biparêze an jî li pey yek serokî bimeşe an rêz bibe. Yekitî ew e ku mirov li ser bingehek neteweyî, ji bo armanc û berjewendîyên gelemperî, ji bo azadî û serxwebûnê bi hişmendîyek kolektîf tevbigere, li ser stratejiyeke hevpar têbikoşe, bingeha hişmendîya neteweyî geş bike û girîngîyê bide helwestên hevbeş, aqlê kurdî derxe pêş.

Hemû beşên civatê û cudahîyên îdeolojîk tenê di bin sîwana netewî de, bi îradeyek kolektîf, bi hişmendîyek neteweyî dikarin rê û rêbazên serkeftinek mayînde peyda bikin û bi hevre derxin holê. An jî bi xebatên hevbeş dikarin ji firsend û derfetên heyî an jî yên demî îstîfade bikin.

Di warê daxwaz û armancên neteweyî de, di warê hedefên nêzîk, navîn û dûr de bernameyek zelal, nexşerêyek esasî, divê weke xetên sor ên neteweyî bingeha dîyalog û pêwendîyan serast bike, li ser stratejîyek mayînde me bi hev girêbide.

Hebûn û nasîna miletê Kurd, divê di bin ewlehîya destûra bingehîn û li ser bingeha hûqûqa navdewletî de bê parastin, kêşaya kurd û Kurdistanê bê qebûl kirin. Divê asteng û zextên li hemberî nasname, ziman û çanda kurdî, bertekên li dijî rêxistinbûnê ji holê rabin. Divê miletê Kurd weke hemû miletên azad xwedî desthilatdarîya xwe be.

Divê bê niqaş, mafê xwe îdare kirinê bête qebûl kirin û li gorî şert û mercên konjonkturê, bi şertê girêdayî erdnîgariyê, daxwazên statûyê (federasyon, xweserî, serxwebûn û hwd.) bi zimanekî hevpar ji cîhanê û raya giştî re bê diyar kirin.

**Dom » R:10**

# Li ber deriyê dîrokê, pêwîstiya yekitiya neteweyî û hişmendiya milî




**Doma » R:9**

Divê parastina pêkhateyên demografîk weke erk bête dîtin û di hemû deman de, li hemberî guhertinên demografîk ên li ser erdnîgariya kurdan, helwestên neteweyî û daxwazên hevpar bên nîşandan.
Rê û rêbazên tifaq, hevkarî û yekitîyê, divê di bin sîwaneke neteweyî ya di ser partîyan re, bi modelekê hevbeş (mînak modela Kongreya Milî, Meclîsa Milî yan bi navekî din) pêk bê û tê de her pêkhate rengê xwe biparêze, lê pêwîst e ku girêdayî stratejiyeke yekgirtî bimîne û li gorî berjewendîyên neteweyî tevbigere.

Ji bo ku ev yekitî tenê di gotinan de nemîne, divê bibe sazîyek bingehîn û bi şaxê rêxistinbûnek milî hemû beşên civatê himbêz bike. Ji bo vê yekê, geşkirina hişmendîya netewî û avakirina stratejîyek neteweyî stûnên bingehîn yên serkeftinê ne.

Divê hemû hewldanên yekîtîyek neteweyî, li ser bingeha hûqûq û plansazîya berjewendîyên neteweyî bê serast kirin. Di navbera tevgerên siyasî yên kurd de, li şûna tundî an reşkirinê, li şûna dijberî û pûçkirinê, divê bingeha hûqûqa diyalog û aştîya navxoyî were bicîhkirin.

Bi avakirina sazîyên neteweyî, pirsgirêk û nakokîyên heyî bi rîya diyalogê, li gor hûqûqa neteweyî rêya çareserîyê parastin wê hêsantir be. Divê zemîna hûqûqî, bi şêweyek gelemperî bête mîsongerkirin ku pirsgirêkên navxweyî bi rêya heyetên rûsipîyan û bi rêya meclis-ên heremî/neteweyî bên çareserkirin.
Yek ji xala girîng jî, li dîasporayê divê dîmenên siyasî yên milî derkevin pêş û ev bi dirûşmên azadî û qêrînên yekgirtî bête xurtkirin. Dîplomasî û xebatên pê ve girêdayî, divê bi rengê yekgirtinek milî tevbigere û derîyê hevkarîya netewî veke. Di heman demê de pêwîst e ku hemû alîyên sîyasî berjewendîyên neteweyî di ser berjewendîyên partî û rêxistinên xwe re bigrin û biparêzin!
Li seranserê cîhanê, li şûna lobîyên cuda cuda yên partîyan, divê kurd bi şandeyeke dîplomasiyê ya hevpar a neteweyî ve bêne temsîlkirin.

Em hemû baş dizanin ku mijara yekitîya siyasî û milî zehmet e, bi êş û birîn e! Lê bi dilsozîya doza welat, bi germayî û fedekarîya milî serkeftin pêkan e. Ev jî, bi belgeyek hevbeş a stratejîya neteweyî mumkun e. Bi şertê ku berjewendîyên partî û alîyan li ser berjewendîyên miletê Kurd neyê girtin. Hewldan û tevger li ser van esasan bimeşe, tevbigere, serkeftin her dem pêkan e, hêsantir e.

Li nav civatê, divê dîmenên yekitîyê û hestên milîbûnê zîndî û xurtir bên şanîdan. Em dizanin ku daxwaz û hewldanên siyasetmedaran têra nake! Divê alîyên sîyasî rê xweş bikin ku civak di bi girseyî hevdu hembêz bikin.

Pêwîst e entegrasyoneke civakî bê avakirin ku tê de hemû zaravayên cûda, pêkhateyên bawerîyên cûda hevdu wekî 'yê din' nebînin û sînorên dêrûnî û erdnîgarî ku dagirkeran ava kirine, pêwîste em ji kûrahîya hest û hişmendîya xwe rakin. Divê em rê nedin ku cardin sînorên îdeolojîk di nav me de neqebên bê wate ava bikin û paşeroja me tarî bikin.

Siyaseta neteweyî, tenê ne karê partîyên siyasî ye. Ji bo ku siyaseta milî di nav civakê de bi hêz bibe û di nav bingehê de belav bibe, divê pêkhateyên wê bên berfirehkirin. Di vir de rola herî girîng û stratejik dikeve ser milên rewşenbîr û akademîsyenên netewperwer. Bi tora sazîyên ramanê (Think-Tank) dikarin rê nîşanî siyasetmedaran bidin û li şûna hemaset û propagandayên rojane, dikarin projeyên aqilane û zanistî pêşkêş bikin ku alîyên sîyasî jê sûd bigrin. Rewşenbîr û akademîsyenên netewperwer dikarin bi nêrîn û ramanên xwe, bi helwest û bertekên xwe, bi rexne û pêşniyarên xwe rolekî çêtir bilîzin.

Hêzên civakî, pêkhateyên civatê, pêşengên civakî, olî û eşîrî divê di avakirina hişmendiya neteweyî ya nûjen de rolek yekitîyê bilîzin. Jin, ciwan û hemû beşên civaka kurd divê weke stûnê hişmendîya neteweyî tevbigerin û bibin dinamoya têkoşîna neteweyî. Têkoşîna jinên kurd, di dîroka nêzîk de ku li hemberî dagirker û hêzên hov, bûye sembolek cîhanî. Pêşengiya jinan, ne tenê karakterê polîtîk nişan dide, di heman deman de karakterê demokratîk û azadîxwazîyê, karekterê yekitîyê derdixe pêş.

Nifşê nû yên ku cîhanê nas dikin û teknolojiyê bikar tînin, dikarin ligel potansiyela xurt a lobîyeke neteweyî li dîaspora tevbigerin, derîyê vê yekitîyê û rîya dîyalogê bi hêzên cîhanî bidin naskirin û vekirin, pêşengîya wî karî bikin. Ev bar û erkê hanê jî dikeve ser milên cîwanên kurd. Di serdema modern û teknolojîyê de cîwanên kurd dikarin bibin aktorên herî çalak û serketî.
Dîrokê çendîn caran daye îspatkirin ku miletên bi hişmendîya neteweyî tevgerîyane, yekrêzîya navxoyî ava kirine, biserketine û bûne desthilatdarê welatê xwe. Miletên yekrêzîya xwe ava nekirine bûne qûrbanên dîrokê û bi şikestin û têkçûnê re rûbirû mane.

Ji ber vê yekê, divê em bi taybetî ji ezmûnên sed salên dawîyê dersan vergirin û bi hevre dîroka kedek hevpar binivîsînin. Divê em bi pratîk û kiryarên xwe, bi xwendin û têgihiştinên xwe, bi fedekarî û xwebexşîya xwe, bi aqlê kurdî, bi îradeyek kolektîf, tovê yekitîyê biçînin û ji nifşên bên re jiîyanek bi rûmet û azad bihêlin.

Divê em baş zanibin ku hespê felekê hertim nayê ber derîyê me û tu carî li benda me namîne û ranaweste! Eger em amade bin, emê li hespa felekê suwar bibin û bigihîjin menzîl û armancên xwe. Rizgarîya miletê Kurd, girêdayî ezmûnên serkeftinê û hişmendîya yekrêzîya milî ye. Hemû şêweyên yekitî û hevkarîyê, li gorî rêgeha serkeftin û têkçûnê, ji stratejîya man û nemanê re hizmetê dike.

Divê em ji derbasbûn û dîroka xwe dersan bigrin û helwestên neteweyî weke pirensîbên jiyanê hilbijêrin. Gava lingên helwestên neteweyî li ser wargeha siyasî, hûqûqî û civakî bi cîh bibe, erdê bigre û rasterast li hedefa xwe kîlît bibe, wê miletê Kurd li ser gopka dîrokê cîh bigre û rola xwe bilîze.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê nûgihanekî xelkê bajarê Pawê bi tundî birîndar kirin

Pêka raporên belavbûyî roja Sêşemî 9ê Kanûna Pêşîn, “Jîwar Rehmanî” nûgihanê temen 17 salî yê xelkê gundê “Neysane” ser bi bajarê Pawê li encama gullereşandina hêzên hov ên rêjîmê gelek dijwarî birîndar bû û bi sedema dijwariya birînan bo nexweşxanerya Taliqanî li bajarê Kirmaşanê hatiye veguhastin.

Hêzên hov ên rêjîmê bê agehdarkirina berê, li halekê de ev maşîn li wir sekinî bûye, bi hêceta vê ku renge ev nûgihan bo kontrola rê bo karê qaçax li wir e, gulle bi ser de reşandine ku pêka zaniyariyan 6 gulle bi “Jîwar Rehmanî” kevtine û 18 gulle jî bi maşîna wî kevtine.

Herwisa hatiye ragihandin ku gulle bi navteng û stuyê wî kevtine û bi sedema wan gulleyan derbe bi maziyepişta wî jî kevtiye û rewşa wî li nexweşxaneyê de bi nebaş hatiye ragihandin.




## Rêjîma Îranê li heftiyekê de zêdetir ji 40 kesî li Rojhilatê Kurdistanê de binçav kirine

Pêka amarên belavbûyî yên mafê mirovî, hêzên hov ên îtilaata rêjîmê li hema 10 heta 17ê Sermawezê anku “1 heta 15ê Kanûna pêşîn”, bi êrîşkirinên neyasayî de bo ser malên welatiyên Kurd, zêdetir ji 20 kesî li bajarên “Bokan, Mihabad, Şino, Merîwan û Dîwanderê” de binçav kirine.

Li piraniya wan binçavkirinên xoserane û bê belgeya yasayî de hêzên hov ên îtilaat rêjîmê bi awayên tundîtîj û bêrîzîker, reftar digel wan binçavkiriyan kirine û li henek cihane de jî teqe li derî û pencereyên wan kirine.

“Kawe Kole û Qadir Kole” li Bokanê, “Sirac Elyasî”, temen 16 salî yê xelkê gundê “Asinawê” ser bi bajarê Şinoyê, “Şaho Îbrahîmî xelkê gundê Alkawê û Şefî`i Ehmedî xelkê gundê Balagîr”ê ser bi bajarê Şinoyê, “Omîd Baqirî” xelkê bajarê “Şabat”ê, wênegir û çalakvanê medenî, “Şoreş Serrût” xelkê gundî Nelîwanê ser bi bajarê Şinoyê, “Îsmaîl Seyîd Mehmûdiyan” ê xelkê bajarê Şinoyê û “Hesen Şadîxa” xelkê gundê Sînganê û “Şiwane Îbrahîmî” xelkê gundê Alkawê, “Şehram Necarî” xelkê gundê Deloyê û rûniştiyê Dizeya Dolê ser bi bajarê Urmiyê û “Aram Cemşîdûn” xelkê gundê Qeredaxê ser bi bajarê mihabadê, navê parek ji wan girtiyane ye ku ji aliyê hêzên îtlaata rêjîmê ve hatine girtin.



Heta belavbûna vê nûçeyê sedema binçavkirinên xoseraneya wan welatiyên Kurd û cihê ragirtin û tohmetên sepandî bi ser wan welatiyan de nehatiye zanîn.

## Rêjîma Îranê li 2 rojan de 23 girtî bidar vekirin


Rêjîma Îranê li roja Dûşemî 15ê Kanûna Pêşîn, 12 girtî û roja yekşemî 2 girtî û roja Şemî 13ê Kanûna Pêşîn de 9 girtî bidar vekiribûn.

Pêka amarên belavbûyî li roja Duşemî 15ê Kanûna Pêşîn, “Mîlad Şêyxî” û 2 girtiyên din ku nasnameya wan nehatine zanîn” li girtîgeha Destgird a rêjîmê li bajarê Îsfehanê û “ Îhsan Nedîmî û Riza Şekûrî” li girtîgeha Lakan a rêjîmê li bajarê Reştê de hatine bidarvekirin.

Herwisa li vê rojê de “Qenber Seferî” li girtîgeha rêjîmê li bajarê Durûdê, girtiyek bi nasnavê “Xuremî” li girtîgeha rêjîmê li bajarê Zencanê, “Maziyar Felahetî” li girtîgeha rêjîmê li bajarê Nêyşabûrê û “Mihemed Bamerî” li girtîgeha rêjîmê li bajarê Kirmanê de hatine bidarvekirin.

Li vê rojê de “Emîrhusên Resûlî” li girtîgeha rêjîmê li bajarê Sawê û “Zahid Îslamî” li girtîgeha rêjîmê li bajarê Kaşanê de hatine bidarvekirin.

Herwisa li roja Yekşemî 14ê Kanûna Pêşîn de jî “Mihemed Rehîmî li girtîgeha rêjîmê li bajarê Gurganê û “Xaliq Zulfeqarî” li girtîgeha rêjîmê li bajarê Yezdê de hatine bidarvekirin.



# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (508)